Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1324 12-Mijdar-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Evîn Teyfûr yek ji çiraxên wêjeya Kurdî ye

Diyala Nîdal \Qamişlo

**Bi destpêkirina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re, jin di hemû qadên şoreşê de pêşengtî kirin, yek ji wan jinên ku di qada wêjeya Kurdî de xwe li pêş xist, Evîn Teyfûr e. Evîn jineke 26 salî ku ji bajarê Kobanê ye û ji 14 saliya xwe ve dest bi nivîsandina pirtûkan kiriye.**



Evîn nivîskareke afrînere wateya peyvên nazik û hesteke xweş, ji bo afirandêriyê sernavê bedewî û xweşikbûnê xêz dike. Xwediyê jêhatîbûneke bêhempa ku tiştan bi awayekî afirîner û balkêş derdixe pêş ku peyvên xwe dike çiraxên ronahî pê tariya şevan ronî dike.

**Zarokatiya Evîn Teyfûr**

Evîn dema ku zarok bû û diçû dibistanê ne ew qas xwendekareke jêhatî bû, lê di nava jiyanê de her tim Evîn li xwe dipirsî û digot çima ev jiyan heye xwezî xewin ba. Dema ku Evîn biçûk bû mirovên derdora xwe nedipejrandin, hizirên pir cuda diketin bala wê. Ruxmî ku ew keçika biçûk a malê bû, lê wê her dem digot pêwîst e ez li gorî xwe bixwînim, tevbigerim û xwe pêş bixim. Xwişkeke wê li zanîngeha Helebê beşa dîrokê dixwend, Evînê li temaşe dikir ku çawa bi pirtûkan re têkildar e, lê ne pirtûkên dibistanan pirtûkên dîtir. Evînê jî got dema ez mezin bibim ez ê weke xwişka xwe pirtûkan bixwînim, ruxmî ku wê ji pirtûkên dibistanê hez nedikir.

Rêjîma berê gelekî hişk bû û gelek zordarî li şagirtên dibistanan dikirin, ev yek di bû sedem ku şagirt ji xwendinê hez nekin. Ji ber vê yekê hezkrina wê ji nivîsandinê re çêbû. Dema ku Evîn 13 salî bû, xwişkên wê jê re digotin ku ji xwe re binivîse. Lê wê ji xwişkên xwe re digot ku ez nizanim binvîsim, ji derveyî dibistanê xweşikên Evînê dixwestin ku wê ferî nivîsandinê bikin. Evîn dema ku 14 salî bû, dest bi xwendina pirtûkan kir, di wê demê de girêdan û hezkirineke wê ya mezin bi xwendina pirtûkan re çêbû. Jêhatbûna jina Kurd Evînê di malê hate xuyakirin û di 18 saliya xwe de dest bi nivîsandina pirûkan kir.

**Evîn Pirtûkên xwe bi zimanê Kurdî dinivîse**

Di destpêkê de dema ku Evînê çîrok dinivîsandin, xwişk û birayên wê matmayî diman. Di heman demê de, bi demê re Evîn fêrî nivîsandina zimanê Kurdî bû. Evîn Pirtûkên xwe bi zimanê Kurdî dinivîse, ji ber ku wê tu xêr ji zimanê erebî ne dît. Ruxmî ku pirtûkên wê bi zimanê erebî jî hebûn, lê dema ku fêrî zimanê Kurdî bû, nivîsandina zimanê erebî rawestand. Êdî Evîn dest bi nivîsandina pirtûkên bi zimanê Kurdî kir.




**Berhemên Evînê**

Di destpêkê de şeş berhemên çîrokan yên Evînê hatin çapkirin, herwiha piştre wêjeya zarok û çîrokan jî hate çapkirin. Di heman demê de, çîroka Siya, Pirtûka Hena Mîna, Lekeya Tirsê hatin çapkirin. Di sala 2020'an de yekemîn pirtûka Evînê hate çapkirin, di wê pirtûkê de şeş çîrokên zarokan hebûn. Piştre pirtûka wê ya bi navê Lêkolînerî hate çapkirin, ev pirtûk di nava xwe de çîrok û wêjeya zarokan di hewîne. Evîn Teyfûr wiha dibêje: "Heger kes bixwaze çavkaniya wêje û çîrokên zarokan nas bikin, dikare li Pirtûka min ya bi navê lêkolînerî biger e."

Evîn nivîskareke li Rojavayê Kurdistanê ye ku li ser wêje û çîrokên zarokan pirtûk dinivîs e.Herwiha piştr e Evîn xwest ku pirtûkek din li ser navê keçika xwe Siya derxe, di heman demê de, Evîn pirtûka xwe ya bi navê Siya nivîsandin û çapkir. Di nava wê pirtûkê de, jî wêje û çîrokên zarokan hebûn.

Evîn dixwest ku kontilorkirinê li xewnên xwe bike,li ser vî bingehî sê çîrokên xewinên xwe nivîsandin. îsal pirtûkeke wê bi navê Lekeya Tirsê hate çapkirin, ev pirtûk di nava xwe de 11 çîrokan dihewîne û ev çîrok jî mîna çîrokên li ser jin, derûnî û şerê mirov li hemberî mirovan ne.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Nanê min li vir nema:**
- Bi heman wateyê.

**Negere li ciyê kaş, nebîne xewna şaş:**
- Neçe ciyê biteşqele û bixeter da tiştek neyê serê te.

**Riya bêserûşûnê ye:**
- Riya venegerê ye; riyeke bixeter e.

**Riya çûn û nehatinê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Riya nehtilbê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Sêla sor e:**
- Bixeter e; ti kes newêre xwe nêzîk bike.

**Sêla sor e yê destê wî hesin jî newêre xwe nêzîk bike:**
- Bi heman wateyê.

Temara mirinê avêtiye ser çavên wî:
- Karê bixeter dike.

**Têrxwarina gur li ser piyan e:**
- Ji bo kesê her tim di xeterê de tê gotin.

**Weke bizina ber bi ecelê xwe ve bireve:**
- Berê xwe dide deverên bixeter.

**Weke dîkê zûbangdayî li te hatiye:**
- Wê belayek were serê te; tu tiştên bixeter dikî wê tiştek were serê te.

**LI SER QEHRÊ**

**Agir di nava wî de ye:**
- Pir diqehire.

**Bi du destan li xwe da:**
- Êş û jana xwe û xemgîniya xwe diyar kir.

**Çokên min fis bûn:**
- Ji qehra hêz bi min re nema.

**Çokên min şkestin:**
- Bi heman wateyê.

**Dilê min bû gola xwînê:**
- Ez pir qehirîm; min pir êş kişand.

Dilê min kir xwîn/dilê min bû xwîn
- Ez pir qehirandim; ez pir hêrs kirim; ez bêzar kirim; ez pir aciz kirim.

**Dilê min reş kir:**
- Bi heman wateyê.

**Di ber de neçû:**
- Pir qehirî; pir li ber ket.

**Di nava xwe de diqiçqiçe:**
- Pir diqehire.

**Ez kezebreşî kirim:**
- Ez pir qehirandim; ez pir hêrs kirim.

**Firşika min reş kir:**
- Bi heman wateyê.

**Girê ket qirika wî:**
- Qirika wî hat girtin; êdî nikariya biaxive.

**Kezeba min xirab bû:**
- Min pir derd kişandin; ez pir qehirîm; min pir kişand.

**Kezeba min reş kir:**
-Ez pir qehirandim; ez pir hêrs kirim.

**Kezeba min peritand:**
- Bi heman wateyê.

**Kezeba min şewitand:**
- Bi heman wateyê.

**Kevir ketin nava min:**
- Ez pir qehirîm; derd û kul ji min re çêbûn.

**Pora mirov spî dibe:**
- Mirov pir pê diêşe; mirov pir pê diqehire.


**Te pirça serê min werand:**
- Te ez pir qehirandim.

**Tu kêrê lê bidî xwîn jê nayê:**
- Pir qehiriye.

**Xwîn lê miçiqî:**
- Pir qehirî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## Jinên Sûriyê di navbera tundî û bêedaletê de

Di destpêka sala 2025'an de Sûriyê derbasî qonaxeke nû bû, gelekan weke serdema azadiyê xeyal dikirin, lê belê ew bi xwe bombeyeke ji kaoseke mezintir bû. Herwiha di nava vê zordariyê de jin armanca herî sereke ji bo tesfiyekirina mezhebî û siyasî bû.**R-2**




## 'Tirkiyê bi hincetan, biryara 3 salan a mayîna artêşê derxist'

Lêkolînerê di Navenda Lêkolînan a Firatê de Lezgîn Ibrahîm da zanîn ku Tirkiyê bi hincetan hebûna xwe di Sûrî û Îraqê de rewa dike, ji ber wê biryarên mayîndekirina artêşa xwe di Sûriyê, Îraq û Lubnanê de ya sê salan derxist.**R-4**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1324 12-Mijdar-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## 'Azadkirina girtiyên siyasî, wê li Tirkiyê roleke demokratîk bilîze'



Parlementerê Partiya DEM'ê yê Amedê Serhed Eren da zanîn ku azadkirina girtiyên siyasî wê ji bo tevahiya Tirkiyê di mijarên qanûnî, aştî û çareseriya demokratîk de roleke girîng bilîze û got, "Divê dewleta Tirk demildest girtiyan berde."**R-5**

## Zûgotinok




Zûgotinok xweşhevokên wêjeya Kurdî ne, xwedî terzekî ken û hakimiyeteke zimanî û çandî ne. Ev cûreya wêjeya Kurdî hevala lîstikên zarokan û şevbuhêrkên civakê ne û di roja îro de ji ber pêşketina teknolojyayê rastî xeteriyê rû bi rû mane.**R-7**

# HPC'Ê PARÊZVANA NIRXÊN CIVAKÊ YE

Endamê Rêveberiya Hêzên Parastina Civakê HPC'ê yê kantona Cizîrê Hemîd Miêş diyar kir ku di vê pêvajoya hestyar ku herêm tê re derbas dibe, li hemberî gef û xeteriyê, rêxistinkirin û parastina civakê ji her tiştî girîngtir e. Herwiha Miêş da xuyakirin ku Hêzên Parastina Civakê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo rêxistinkirin û ewlehiya civakê kar û xebatê dide meşandin.**R-6**



## Geşedanên leşkerî û siyasî di Rojhilata Navîn de

Rojnamevan Kakşar Oremar diyar kir ku li gorî raporek tora Îsraîlî ya bi navê "KAN", Misir, Azerbaycan, Qeter, Urdun û Endonezyayê amadebûna xwe ji bo şandina leşkeran bo Xezayê ragihandine û got, "Tirkiyê jî niyeta xwe ya beşdarbûna di pêvajoya çavdêriya agirbestê li Xezayê de bi şandina leşkerên xwe û piştgirîkirina pêkanîna wê ragihandiye."**R-3**



Li Sûriyê, divê jin berpirsyartî rabike
Nehîr Pale R-2


Nirxandinek di hevdîtina Tramp û El Şeri de!
Dilyar Cizîrî R-4


FARC Û PKK'ê
Farûk Sakik R-5

HTŞ'ê di enîyên Rojava û DYA' de ye!!!
Zekî Bedran R-5


Germahiya hevgirtinê
Rohat Bulut R-6

# Jinên Sûriyê di navbera tundî û bêedaletê de

Di destpêka sala 2025'an de Sûriyê derbasî qonaxeke nû bû, gelekan weke serdema azadiyê xeyal dikirin, lê belê ew bi xwe bombeyeke ji kaoseke mezintir bû. Herwiha di nava vê zordariyê de jin armanca herî sereke ji bo tesfiyekirina mezhebî û siyasî bû.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Ji destpêka sala 2025'an ve, bi dehan jin li Sûriyeyê winda bûne di heman demê de li hember tundiyeke hovane rast hatin weke tecawîzkirin û revandinê, ku ev yek nîşana zêdebûna metirsîdar a tundûtûjiya li dijî jinan piştî hilweşîna saziyên dewletê ya berê ye. Ev diyarde ne nû ye, lê belê berdewamiya dîrokeke dirêj a binpêkirinan e, ji ber ku revandin û destdirêjiya li ser jinan bi salan e wekî amûrek ji bo terorîzekirina civakên herêmî di dema şer û pevçûnan de tê bikar anîn.

Piştî hilweşîna rejîma Baas'ê û hatina HTŞ'ê li ser desthilatdariyê herêmên perava Sûriyê şahidiyê zêdebûna tundî û binpêkirinên mafên mirovan hat ku gihaşt asta pêkanîna komkujiyên komî di Adara vê salê de, vê yekê hiştî ku aloziya mirovî li welat girantir bibe. Kuştin û tesfiyekirin bi armanca sepandina kontrolê û tolhildanê pêk hatin, bêyî ku ewlehiya welatiyan ango mafên wan ên bingehîn werin berçavgirtin. Di piraniya herêmên Sûriyê de kuştin û tundiyê pêk hatin, lê yên herî ku zirar û binpêkirin pêk hatin li perava Sûriyê û Swêdayê bû, çekdarên hikumeta HTŞ'ê bi taybetî welatiyên ji mezhebên Durzî û Elweî hedefgirtin, di encamê de bi hezaran kes jiyana xwe ji dest dan. Di çarçoveya van binpêkirinên xwînî de, jinan ziyana herî mezin kişandin; jinên li van herêman rastî gelek awayên şîdeta fîzîkî û psîkolojîk, binçavkirina keyfî, kuştin, tecazkirin, revandin, koçberkirina, bi darê zorê û veqetandina ji malbatên xwe hatin ku bûne qadeke ji bo çareserkirina hesabên siyasî û mezhebî.

**Di navbera Çile û Îlona 2025'an de, sê xalên sereke yên şîdeta li dijî jinan derketine holê:**

**1-Li berava Sûriy(Laziqiy, Tertûs û Hema)**

Li gorî rapora Reutersê di (Hezêrana 2025'an) de, bi kêmanî 33 jin û keçên ciwan ku temenê wan di navbera 16 û 39 salî hatin revandin, hin ji wan hatin berdan piştî dayîna fîdyetê, hejmarek din di şert û mercên ne diyar hatin windakirin, armanc ne darayî bû lê siyasî û mezhebî bû, name ji bo mezehbê bi giştî bû ku qûnaxa wan bi dawî bû, ev yek piştî êrişa ku li ser van herêman pêk hat ji hêla çekdarên girêdayî hikumeta veguhê û çeteyên biyanî ku cihê xwe




di nav Wezareta Parastinê digrin.

**2-Siwêda:**

Ji naveresta tîrmeha 2025'an de û heya Îlûnê, Netewên Yekbûyî 105 rewşên revandina jin û keçên ciwan ji Cebel -El Ereb belge kir, 80 ji wan hîn winda ne heta îroj raporên meydaî tekez kiriye ku tecawiz li hin wan jinan hatiye kirin berî ku bên kuştin. Ev şêwaz ne tenê sûceke, lê belê îfadeya şerê li dijî nasnameyê ye ku jinan hedef digrin ji ber ku ew sembola mezhebê ne, ev yek jî di encama êrişa hikumeta veguhêz pêk hat û derxistina fitneyê di navbera gelê Siwêdayê û Bedû de.

**3-Qurbaniyên tundiya komî:**

Di mehên detpêkê ya sala 2025'an de, li herêmên Beravê û Siwêdayê komkujiyên hovane pêk hat. Li Siwêdayê tenê 1000 sivîl hatin kuştin di nav de hejmareke mezin ji jin û zarokan di heman demê de 33 gund hatin şewitandin. Çekdarên girêdayî hikumeta veguhêz cudahî nexistin di navbera jin û mêran de, lê qurbaniya herî mezin ku zirar dît jin bûn di riya windabûna zarok û hevjînan herwiha yên li hember tecawizkirinê û revandinê hatin.

**Necezakirin xeleka hetî xeter e**

Giştî ev sûc berfireh nedibûn eger desthilatdariyeke dadwerî hebûya, dadgehên herêmî windabûn an jî hevkarbûn, dezgehên ewlehî beşdarbûn an jî bê hêz bûn. Bêcezabûna ne tenê tê wateya ku sûcdar nayên darizandin, lê peyameke zelal dide nîşandan ku dibe ku sûc dîsa pê bê, ev yek rave dike ji ber berdewamkirina revandin û tecawiz li hin deveran.

Ji destpêka sala 2025'an de û heya roja îro, ezmûna Sûriyê îspat kiriye ku hilweşîna rejîmekê nayê wê wateyê ku azadî tê vejîn kirin; berevajî vê ew deriyê valahiyek pir xeternak vedike û jin yekem kes bûn ku bedela vê valahiyê dan.

## ‘Weqfa Jin li kampa Waşokanî ji bo piştgiriya jinê dixebite’

**Hêvî Keleş/ Hesekê**

**Rêveberiya Ofîsa Weqfa Jin a kampa Waşokanî Cewahir Ezo destnîşan kir ku karê wan li kampa Waşokanî di warê rewşenbîrî, aborî û tenduristiyê de alîkariya jinan dike.**

Di bin dirûşmeya “Jinên Azad bingeha civakeke azad in”de, Weqfa Jinên Azad di Îlona 2014”an de li Rojava hate damezrandin. Armanca wê ew e ku jinan di warên aborî, çandî, civakî û tenduristiyê de bihêz bike, beşdarî çareserkirina pirsgirêkên ku ew pê re rû bi rû dimînin bibe û civakê bi rêya perwerde û hişyarkirinê pêş bixe. Xebata wê ne tenê bi hişyarkirin û perwerdekirina jinan li bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ve sînordar e, lê di heman demê de perwerde û hişyarkirina jinên li kampên penaberan jî vedihewîne, wekî kampa Waşokanî, ku di sala 2019”an de ji bo kesên bi zorê koçberkirê ne ji bajarê Serêkaniyê û gundewarên derdora bajarokê Til Temirê, ku ji hêla Tirkiyê û çeteyên wê ve hatibû dagirkirin, hate damezrandin.

Derbarê kar û xebatên Weqfa Jin



di kampa Waşokanî de Rêveberiya Ofîsa Weqfa Jin a kampa Waşokanî Cewahir Ezo ji Rojnameya me re axivî.

**‘Em alîkariya jinan bi riya perwedeyan dikin’**

Rêveberiya Ofîsa kampa Waşokanî Cewahir Ezo anî ziman ku Weqfa jin di nav kampê de ji bo rêxistinkirina xwe xebitiye, bi rêya dersên perwerdehî, rewşenbîrî û tenduristiyê di nav jin û keçan de li ser mafên wan hişyariyê dide û wiha got: “Weqfa Jin hewil dide ku jinan ji hêla aborî ve bi pêşkêşkirina kursên perwerdehiya pîşeyî û piştgiriya wan di vekirina karsaziyên biçûk de bihêz bike, di heman demê de ji wan re perwerdeyên dirûtina cilan, fêrkirina zimanê kurdî û mudaxeleyê yekemîn vedikin. Em alîkariya jinan bi riya hişyarkirina wan û perwerdekirina wan li ser bidestxistina mafê wan ên jiyanê dikin. Piştî perwerdekirina jinan em bawernameya didin wan, her sal em bi van perwerdeyan radibin, di destpêka ku me dest bi pewerdeyên dirûtina cilan, mudaxeleyên yekemîn yan jî fêrkirina zimanê kurdî kir, hejmara jinên tevlî dibûn ji 15 heta 25 bû lê di dema niha de hejmara jinên ku tevlî perwerdeyan dibin dighêje 10 jinan, ji ber ku gelek jin ji perwerdeyên me derçûne. Di destpêkê de, me ji bo nasandina karê Weqfa Jinan ji bo jin û keçan xebitîn. Piştre, me dest bi pêşkêşkirina cûrbecûr kursan kir, ji perwerdehiya rewşenbîrî bigire heya perwerdehiya pîşeyî, da ku piştgirî bidin jinên ku bi zorê koçber bûne û piştgiriya exlaqî û psîkolojîk bidin wan. Her wiha kursên ziman, di nav de yên rekreasyonê jî, ji bo zarokên 6-8 salî me dan destpêkirin. Bi rêya perwerdeyên ku em bi hevrêziya komînan li dar dixin, em hewil didin ku alîkariya jinan bikin, hişmendiya wan bilind bikin û rewşa wan a psîkolojîk a ji ber êşa wan a piştî koçberkirinê baştir bikin, ji bilî vê, em wan ji hemû cureyên tundûtûjiyê diparêzin bi agahdarkirina wan li ser mafên wan.”

Cewahir Ezo axaftina xwe wiha berdewam kir: “Di kampê de rewşa jinan ji aliyê aborî ve xirabe, ji ber ku ew hewcedarî gelek pêdiviyane, di vekirina karsaziyên wan ên biçûk de ji ber amûrin hene bi me re peyda nabin ji bo wan, ev jî dibe astengî li ber me ji bo alîkariya wan. Di dema destpêka vekirina navendeke me li kampê zewaca keçên bi temen biçûk çêdibû, herwiha tundî li ser jinan dihat kirin, lê belê di dema niha de rewş hatiye guhertin, gelek cûdahî çêbûye ji wê demê ve. Û zehmetiyên ji aliyê zihniyeta zilam ve li ber me derdiket ku gelek zilam qebûl nedikirn ku jinên wan yan keçên wan tevlî perwerdeyên me bibin ji ber ku tirseke di nava wan de hebû ku jin bi hêz bibe û nema bi hacet wan be, lê bi demê re me karîbû li hember vê zihniyetê bisekirinin û bi jinan re bibin alîkar û bi riya perwedeyan wan hişyar bikin, bihêlin ku xwe bispêrin xwe.”

**Ji Pênûsa Jin**

### Li Sûriyê, divê jin berpirsyartî rabike

**Nehîr Pale**

Sûriyê ji aliyê îdeolojîk ve xetimî ye, aborî bê çare ma ye, siyasî û civakî jî her çiqasî rejîm were guhertin jî dîsa nikare pirsgirêkên xwe yên civakî çareser bike. Bi taybet Hikûmeta Demkî ya Şamê ti projeyên wê yên çareserkirina pirsgirêka zayendperestî ya civakî nîne. Berevajî; zagonan ji bo cilûbergên jinê datîne. Mîna hemû sîstemên dagirker sînor ji jinê re danîne, vê hikûmet jî heman sînor ji jinê re diyar kirine. Her wiha çawa oldaran di bin navê ol de gelek tişt li jinê heram kirine û ew qeyd kirine, niha Hikûmeta Demkî ya Şamê heman tiştî dike û destpêkirine zagonan li ser jinê ferz dike. Sîstemên dagirker, dewlet û ol ne mumkine destûr bidin jinê ku bifikire û berpirsyartî rabike. Heyanî ji destê wan tê jinê difetisînin û dawî li hebûna wê tîn in. Hebûna jin li ser sîstemê gelekî xeter e. Jina Sûrî çawa hêvî ji Hikûmeta Demkî ya Şamê dike ku jêre bibe hêz û pirsgirêkên wê çareser bike. Divê hemû jin çavên xwe vebikin û bibînin ku sîstema heyî nikare pirsgirêkên wan çareser bike. Tenê jin wê bikarbin pirsgirêkên xwe çareser bike.

Jin wê çawa pirsgirêkên xwe çareser bike? Têkoşîneke jin a bi sedê salan heye, bi taybet jinê di Tevgera Azadiya Kurdistanê de gelek qeyd û zincîr şikandin û ji hemû aliyan ve berpirsyartî rakir. Jinên Sûrî jî ciyê xwe di vê têkoşînê de girtin û hîna têkoşîna xwe berdewam dikin. Wê demê divê li pêşiya Hikûmeta Demkî ya Şamê û çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker bigre. Zagonên hukmê koletiyê li jina Sûrî dibirin û li ser jinê ferz kirin. Destpêke; destûr nadin jina Sûrî di çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê de berpirsyartî rabike. Li ser wê ferz dikin ku serê xwe ji saziya malbatê dernexîne û jinên di saziyên wan de dixebitin xizmeta sîstema wan bikin. Piştre wê mîna dewleta Îranê polîsên exlaqî yan jî saziyên exlaqî deynin ser serê jinên Sûriyê û wan bişopîn in. Pirsgirêkên exlaqî jî bi girtin û kuştinê li ser tê girtin û jinan dirizîn in.

Jinên Sûrî eger hêvî ji sîstemên dagirker bikin ku pirsgirêkên wan çareser bikin, wê xwe bixapînin û dîsa çarenûsa wan têkeve destê desthilatdaran de. Ji ber vê yekê jinên Sûriyê neçarin ku berpirsyartî rabikin, xwe birêxistin bikin, parastina xwe bikin û li ser çareseriyê lêkolîn bikin. Ew nikarin çarenûsa xwe ji Hikûmeta Demkî ya Şamê re bihêlin.

Tevahî gelê Sûriyê êdî ji şer westiyane û aştiyê dixwazin lê belê jinên Sûrî nikarin bi vî awayî bifikir in. Hikûmeta Demkî ya Şamê hîna negotiye ku li Sûriyê pirsgirêka jin heye yan jî mafên jinê hatine binpê kirin. Ji destpêka hatina xwe ve rêzik û zagonan li ser jinê ferz dikin. Bi qasî girîngî dane desmalê girîngî nedane ti mafên jinê. Ya girîng li gel wan jin xwe bi cilên reş bipêçe, pora wê diyar neke, bêdeng be û ji derveyî zagonên ol, malbat û dewletê tevnegerê. Eger jin li Sûriyê berpirsyartî raneke û girîngî nede rêxistinkirinê, wê hemû deskeftiyên xwe wenda bike.



# ‘Nivîsandina pirtûkan li ser jiyana Kurdan pir bi êş e’

Nivîskar Ciwan Silo ji destpêka sala 2018' an de dest bi nivîsandina pirtûkan kiriye. Silo diyar kir ku nivîsandina pirtûkan li ser jiyana Kurdan pir bi êş e.

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Kurtejiyana Ciwan Silo**

Ciwan silo nivîskarekî kurd ji bajarê Qamişlo ye herwiha wêje û zimanê erebî xwendiye û li dibistanên herêmê weke mamosteyê ziman kar kiriye di heman demê de ew di şopdarê rojê de wek endam cihê xwe girtiye. Di heman demê de wî di romana bi navê ‘Têkoşîn û Serpêhatiyên Rê’ nivîsandiye. Romana Têkoşîn û Serpêhatiya Rê behsa çar lehengan dike ku ew li hemberî terora DAIŞ'ê ku çawa şer dike, romana têkoşîn jî jîngeriya jineke YPJ'ê ye. Wî bi nivîsandina romanan re jî çîrok nivîsandine. Çîrok bi navên ‘Axa Şingalê Ewrên Bêhin Xweş, Sibe Pir Rengên Bîranînan û Hawarên Berbanga Miriyekî nivîsandine. Naveroka nivîsên Ciwan Silo li ser rewşa civakî, mirovî, doza gelê Kurd û lehengiyên wan, girêdana Kurdan bi axê û hin li ser venasîna şoreşê ne. Ciwan di Festîvala Osman Sebrî de xelata çîrokê wergirtiye, wî heya roja îro bi nivîsên xwe yên zêrîn ên têrwate xebata xwe didomîne.

Nivîskar Ciwan Silo di derbarê jiyana xwe de ji rojnameya me re axivî.

**‘Di sala 2018’ an min dest bi nivîsandina pirtûkan kir’**

Nivîskar Ciwan Silo diyar kir ku di destpêka sala 2018'an de dest bi nivîsandina pirtûkan kiriye û wiha got: “Yekemîn pirtûka ku min nivîsand bi navê ‘Sihabet Itir bû û di sala 2019'an de jî piştî çend pirtûkên ku min nivîsandibûn bi dilekî kêfxweş derbasî pêşengehan bûm û di heman demê de min çar roman û çar kurteçîrok jî nivîsandin, ji xwe nivîsandin warekî mezin e û barekî giran e kesê ku binvîse divê mejiyê wî vekirî be, min jî xwest ku binvîsim û piştire min bi hêzeke mezin wek waqas nivîskaran dest bi nivîsînê kir û ez pir kêfxweş bûm ku ez roj bi roj bi roj li pêş dikevim, heya niha ez tevlî gelek pêşengehan jî bûme.”

**‘Jiyana Kurdan pir bi êş e’**

Ciwan da zanîn ku nivîsandina pirtûkan li ser jiyana Kurdan pir bi êş e û wiha bi dawî kir: “Nivîskarên Kurd li Qamişlo barekî pir giran dikeve ser milê wan de ji ber ku dema li ser bûyerên niha yên weke şehîdan û birîndaran dinvîsin weke ku em bi wan re jiyan dikin û pê bandor dibin. Pirtûkên min jî yek jê bi navê Vegera li Kobanê daket



li Weşanxaneya Mezopotamiyayê, herwiha pirtûkek din jî li ser çar şervanên birîndar û kurteçîrokên li ser birîndaran jî min nivîsandine. Di van pirtûkan de min xwest ku êşên hevalên xwe yên birîndar derxim da ku milet bixwînin ji bo bizanibin çiqas êş di jiyanê de heye. Ji xwe divê nivîskar bikaribe êş û derdê milet derxîne û ji cîhanê re diyar bike. E z jî yek ji wan nivîskaran im ku dê hertim pirtûkan binvîsim û bi hêvî me ku her kes pirtûkên min bixwîne.”

## Zûgotinok

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Zûgotinok xweşhevokên wêjeya Kurdî ne, xwedî terzekî ken û hakimiyeteke zimanî û çandî ne. Ev cûreya wêjeya Kurdî hevala lîstikên zarokan û şevbuhêrkên civakê ne û di roja îro de ji ber pêşketina teknolojyayê rastî xeteriyê rû bi rû mane.**

**Pênaseya zûgotinokan?**




Zûgotinok bi navekî din çîvanok, di nava wêjeya gelêrî de weke çîrok, çîrçîrok, mamik, qewlêrk, zêmar û hwd… cureyeke serbixwe ye û yek ji şaxên wêjeyê ye. Zûgotinok, herî zêde di wêje û folklora zarokan de cih digire û bêhtir ji bo xweşdemborî, hilbijartina pîrikên lehîstikan û herwiha di çîrçîrokan de têne bikaranîn. Di edebiyata Kurdî de, nemaze ya gelêrî de, xebatên wekî şîrove, lêkolîn û lêgerînê hîna jî nehatiye asteke bilind. Ji ber vê yekê di vê xebatê de hewl hatiye dayin ku, li ser zûgotinokên Kurdî xebateke lêkolînê bê dayîn û bi vî awayî kêmasiyek bê dagirtin. Zûgotinok cureyeke ji edebiyata gelêrî ye û li gelemperiya deverên Kurdan de ji aliyê her curenifşên mirovan ve, nemaze ji aliyê zarokan ve, tê bikaranîn. Ji nifşên rabirdûyê bi awayekî devkî gihîştiye heta nifşên îroyîn.

**Sûda wan ji bo ziman**

Di bingeha zûgotinokan de carinan metelok û çîrokên bi wate, carinan jî ên bê wate tê gotin. Ji xwe gelek caran gotinên di nav zûgotinokan de jî bê wate ne. Hinek zûgotinok jî hene bê dawî ne û hinek jî hene kin in. Ji xwe mirov dikare bêje ku zûgotink wek helbestên Kurdan ên kevin tên qalkirin, lê di rastiya xwe de ne helbest in. Dema ku mirov bi şeklekî berfireh li zimanê Kurdî binêre, em ê di ferqa dewlemendiya kûrahiya zûgotinokan bikevin. Ji ber vê yekê bi saya zûgotinokan zimanê Kurdî li ser piyan maye. Lewma bi xêra zûgotinan zarok dikarin bi rihetî fêrî zimanê xwe bibin. Mirov dikare bi dubarekirina zûgotinokan, zimanê dayîkê bi zarokên xwe bide hezkirin. Ji ber ku di zûgotinokan de ziman kesayetiya mirovan pêşve dibe û bi riya ziman cîhana xwe ya fikrî ava dikin. Ji ber ku aliyê wan ê lîstikê heye zêdetir bala zarokan dikişînin û zarok ji wan hez dikin.

**Beşên zûgotinokan**

Zûgotinokên Lehîstikî: Ev cure zûgotinok, ji ber ku di nava lehîstikan de cih digire, bêhtir ji bêje yan têgînên bêwate pêk tê. Zûgotinokên lehîstikî, ji bêjeyên tên zanîn û nayên zanîn an jî, ji bêjeyên çêder têne afrandin. Mînak: Zarok, kefa destên xwe didin erdê û tiliyên xwe ji hev vedikin. Piştre dor bi dor tiliyên hev dijmêrin û dema ku dijmêrin jî vê zûgotinokê dibêjin: “Hêklo mêklo çarim çêklo hestiyê kewê ber bêderê kew firî, mamo dirî.”. Dema ku vegotina vê zûgotinokê bi dawî dibe, hemû zarok destê xwe dikin wek çûkê û dibêjin “pirrrr” û wê çûkê difirînin. Zûgotinokên Xeberoşkî: Di cûrekirina zûgotinokan de beşeke din jî zûgotinokên xeberoşkî ne. Zûgotinokên li dawîn cih digirin jî, dîsan bi mebesta peyamdayînê têne ve gotin. Bi gelemperî peyam ew e ku, encama xirabkeran xirabî ye, ya qencîkeran jî qenc e. Di vê mînaka jêrîn de bêjer, çîrçîroka xwe bi zûgotinokeke henekbazî wiha bi dawî dike: Çîroka min xweş, ka difilek zebeş.

Zûgotinokên Serbixwe: Ev cure zûgotinok, ji aliyê bikaranîn û hejmara xwe ve ya herî berbelav e. Zûgotinokên serbixwe, ji pêyvên bilêvkirina wan ne hêsan pêk tên. Di zûgotinokên serbixwe yên ku bilevkirina wan dijwar de, heman rêbaz her têne dûbarekirin. Ji ber vê yekê jî vegotin behremendiyeke kesane dixwaze: “Çîko çû mala çîko got: Ka çîka çîko.” “Rêvî li rê zîvirî, Rê li rêvî zîvirî.” “Heft hirç, heşt hirç Her heft hirç, her heşt hirç Her heft hirçê pişt bi pirç Her heşt hirçê pişt bê pirç.” “Pişk û mişk di qulê de Min pişk xwar, mişk ma qulê de.”

Zûgotinokên hejmaran:

Çil û çar û çardeh

Bîst û pênc û pazdeh

Hevdehek û du hejdeh

Hinek zûgotinok ji hevokekê pêk tên wek; kurm qurm qul kir.

**Girîngiya zûgotinokan ji bo zarokan**

Ji bo ku zarok bi awayekî baş hînî axaftinê bibin, şa bibin û bilîzin zûgotinok tên gotin an bikaranîn. Ji bo mezinkirin û gihandina zarokan xwediyê roleke girîng in. Zarok bi rêya zûgotinokan taybetiyên ziman, çi pergala ziman a giştî çi jî hûrgiliyan di hiş û bin hişê xwe de bi cih dikin. Di derbarê zûgotinokan de gelek pênaseyên cuda cuda hene, binavkirina wan li gorî deveran diguhere, her herêmek li gorî rewşa xwe navekî lê dike. Li herêmên cuda cuda bi navê; Zûbêjok, Zorbêjok, zûgotinok, çîvanok, bizelêv û hwd tê naskirin. Lê mirov dikare bêje ya herî zêde ku di nava xelkê de tê bikaranîn zaûgotinok e.

**Di serdema heyî de zûgotinok**

Her çiqas zûgotinok wek beşekî têkildarî zarokan bê binavkirin û nirxandin jî di civatên mezinan de jî cih digrin. Di hînkirina ziman de bi hêsanî mirov dikare bi kar bîne û sûdê ji wan bistîne. Dîsa ji bo sererastkirin û çareserkirina pirsgirêkên vegotin û bilêvkirinê jî sûd jê tê wergirtin. Lê bi pêşketina teknolojyayê re êdî hin bi hin çanda gotina zûgotinokan di nava civakê de, bi taybet li nava nifşên biçûk. Di salên beriya 2010'an de şevbuhêrk di nav Kurdan de çêdibû, da ku ken were civatê, bavpîr û dayikên bi temenên mezin zarok û neviyên xwe li dora xwe kom dikirin û zûgotinok digotin. Li aliyekî din lîstikên dema berê yên ku zarok pê wextê xwe diborandin, nema tê dîtin û zarok bi mobayl û lîstikên serdema nûjen ên teknolojî dilîzin. Rast e, serdem û hişmendî li pêş dikeve û her demek taybetmendiyên wê hene, mijara lîstik û zûgotinokan jî wiha ye, lê parastin hem jî bikaranîna zûgotinokan ji hêla zarokan ve tiştekî girîng e. Kurd mîna hemû netewên din tûşî vê diyardeyê bûne, ku milê çanda devokî ya Kurdî rastî qirkirinê tê. Wekî tê zanîn zûgotinokên Kurdî mîna pend û gotinên pêşiyan in, lê gotinên pêşiyan kêm zêde hatine belgekirin û nivîsîn. Ya girîng ew e ku zûgotinok di nav ruhê zarok û tevahiya qadên civakê ji hêla desteyên perwerdeyê, dezgehên fêrkirinê, dibistan mamoste, rewşenbîr, malbatê ve werin vejandin. Bi riya vê yekê şadweriya wêjeyî û deronî were afrandin û ev cûreyê zengîn ê wêjeya Kurdî were parastin.

# 'Pêvajo hestiyar e û HPC'ê parastina civakê dike'

**Endamê Rêveberiya Hêzên Parastina Civakê HPC'ê yê kantona Cizîrê Hemîd Miêş diyar kir ku pêvajoya ku niha Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê re derbas dibe pêvajoyeke pir hesas e û got, "Di vê pêvajoyê de pêwîst e bêhtir Hêzên Parastina Civakê HPC'ê bi erkê xwe rabin."**

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**



Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo ku civak parastina nirxên xwe yên wek nasname û çandê bike, rêbaza pergala parastina cewherî an jî civakî pêş xistiye. Di heman demê de, pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev pergal pêş xistin ku êdî bûye saziyeke hevgirtî. Ev hevgirtin ji taxan bigre heya eniyên şer li dijî êrîşên derve, yên terorîstan û şerê taybet disekine. Pergala parastina li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi sazûmaniya xwe ya tijî û dagirtî di her qadan tê naskirin, mîna şaneyek ku xwe di meclis û saziyên civakî de pêş xist û ava kir. Gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ber mercên şer pêwîstî bi parastinekê xweser a bi îradeya xwe dîtin. Ji lewra yekîneyên sivîl di nava civakê de hatin avakirin, mîna striyên gulan ku şaxê gul biparêze ye. Hizra parsatina cewherî anî jî parastina civakî dirust bû û encamên balkêş bi xwe re anî, mîna vê yekê li bendava Tişrînê hate xuyakirin.

Di derbarê girîngî û parastina Hêzên Parastina Civakî HPC'ê de, endamê Rêveberiya Hêzên Parastina Civakê HPC'ê yê kantona Cizîrê Hemîd Miêş ji Rojnameya me re axivî.

**'Niha herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di pêvejoyeke pir hesas re derbas'**

Hemîd Miêş anî ziman ku niha herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di pêvejoyeke pir hesas re derbas dibe û wiha got: "Divê pêvajoya ku niha em tê re derbas dibin, weke Hêzên Parastina Civakê HPC'ê gelek kar û xebat ji me tê xwestin. Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û heta êrişên xw yên li ser Rojavayê Kurdistanê rawenestandin e. Herwiha dagirkeriya Tirk bê navber şerê leşkerî û taybet li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin. Dewleta Tirk binesaziya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê toparan kir, da ku gel li dijî Rêveberiya Xweser derkeve. Lê belê rêxistbûna gel û têkoşîna Hêzên QSD'ê êrişên dewleta Tirk a dagirker vala derxistin. Lewma bi rihê şerê gelê Şoreşgerî ev kiryarên dewleta Tirk a dagirker li ser herêma me vala derketin.
Li hemberî van gef û êrişên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêxistbûn û parastina civakê ya herî girîng e, di heman demê de li hemberî van êrişên dewleta Tirk a dagirker Hêzên Parastina Civakê bi rola xwe lîstin û bi erkê xwe rabûn. Kiryarên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku didan meşandin, Hêzên Parastina Civakê HPC ê' li pêşiya çavê cîhanê vala derxistin."

**'Di nava gel de perwerdeyên me berdewam in'**

Miêş da zanîn ku di vê pêvajoya niha de pêwîst e Hêzên Parastina Civakê bêhtir bi erkê xwe rabin û wiha pê de çû: "Pêwîst e em di vê pêvajoya niha pir hişyar bin, ji ber ku hem şerê leşkerî û hem jî şerê taybet li ser herêma me tê meşandin. Dewleta Tirk a dagirker dixwaze ku şerê taybet di nava civaka me pêş bixe û pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê li djjî hev derxin. Herwiha weke Hêzên Parastina Civakî HPC'ê asta rêxistin bûna xwe bêhtir xurt bikin, lewma pêwîst e civak, komîn û komîteyên parastinê werin birêxistin kirin. Da ku şerê li ser herêma me tê meşandin vala derkeve.
Perwerdeyên me weke Hêzên Parastina Civakê HPC'ê berdewam in. Di nava gel de em perwerdeyan bi girsayî vedikin û ev perwerde li komînan tên dayînin. Di heman demê de, perwerdeyên me bi giştî li ser mijara parastinê ne û çawa civak xwe birêxistin bike. Helbet dema ku civak birxistin û perwerde kirî be tu kes nikare wê civakê ji hev parçe bike. Herwiha em perwdeyên leşkerî jî ji bo gel vedikin, mîna bi karanîna çekan. Perwerdeyê me li ser şerê leşkerî û taybet jî berdewam in."

**'Niha Hêzên Parastina Civakê HPC'ê bi şev û roj parastina civakê dikin'**

Endamê Rêveberiya Hêzên Parastina Civakê HPC'ê yê kantona Cizîrê Hemîd Miêş axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev perwedeyên ku me dan di gelek aliyan de encam girtin, me ev yek li bendava Şehîdan a Tişrînê dîtin. Dema ku dewleta Tirk a dagirker çawa bi awayekî hovane bendav toparan kirin, li hemberî van êrişan ciwanên me yên di nava Hêzên Parastina Civakê de li kêleka Hêzên QSD'ê berxwedaneke dîrokî dane meşandin. Di heman demê de, dema ku rêjîma Baas hate hilweşandin hêzên me di gelek aliyan de nobet girtin. Niha Hêzên Parastina Civakê HPC'ê bi şev û roj parastina civakê dikin û ji her êrîşeke ku were li ser herêma me ji bo parastina herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê amede ne. Zehmetiyên ku li pêşberî me der dikevin ew jî kêmbûna derfetên madî ne, lê ruxmî vê yekê HPC'ê bê navber karê xwe bedewam bikin. Di vê pêvajoya niha de pêwîst e ku em asta rêxistinbûna xwe hîn zêdetir xurt bikin."

# Agirê laşên zarokan di bîranînê de nehatiye vemirandin

**Roheyiv Keleş/ Qamişlo**

**Di 13'ê Mijdara 1960"an de, bajarê Amûdê şahidiya karesateke mirovî ya trajîk kir dema ku agir bi hola sînemaya Amûdê ket, xewnên bi sedan zarokan vemirand. Ev agir ne tenê bûyerek demkî bû, lê birîneke mayînde bû di bîra bajarê Amûdê û gelê Kurd de bû.**




Di 13'ê Mijdara 1960"an de, bajarê Amûdê yê Rojavayê Kurdistanê bi trajediyekê şiyar bû, ku giyanê wê hejand û rûyê wê her û her guherand. Di wê rojê de, xewnên zarokatiyê di hola sînemayê ya biçûk de ku çend kêliyan beriya karesatê tijî ken û kêfxweşiyê bû, ji aliyê agir ve hatin şewitandin. Di nav çend xulekan de, ew cih veguherî cihekî tirsnak û mirinê û di bîra nifşan de bi navê Şewata Sînemaya Amûdê ma ku yek ji karesatên herî tirsnak ên mirovahiyê di dîroka Sûriyê de ye.

**Amûdê bû bajarekî bêdeng, di nav êşa dayikan û hêstirên bavan de**

Sînemeya Amûdê yek ji wan çend navendên çandî yên wî bajarê bêdeng bû û bi rêkûpêk fîlm ji bo bûyerên civakî û neteweyî lê dihatin nîşandan. Di wê roja çarenûssaz de, rayedaran biryar dan ku fîlmek Misrî bi navê "Qehremanên Giravê" nîşan bidin da ku pereyan ji bo piştgiriya şoreşa Cezayîrê li dijî kolonyalîzma Fransî berhev bikin. Ji bo teşwîqkirina beşdarbûnê, xwendekarên dibistana seretayî bi berdêleke sembolîk hatin vexwendin ku beşdarî sînemeyê bibin, bêyî ku ewlehiya cihê sînemeyêan ji bo hejmareke ewqas mezin a zarokan were hesibandin.
Hola biçûk bi sedan zarokan tijî bû ku bi hewes bûn fîlm temaşe bikin. Lê kêfxweşiya wan kurt bû, ji ber ku ji ber kurtbûna elektrîkê li beşek ji avahiyê ji nişkê ve agir derket. Agir bi lezeke ecêb li hundirê holê belav bû, ku piraniya dîwar û banê wê ji dar û materyalên şewatbar hatibûn çêkirin, di heman demê de ne amûrên vemirandina agir û ne jî rêyên revê yên têrker hebûn.
Dema dûxaneke stûr bilind dibû, zarokan hewl dan ber bi yekane deriyê ku ber bi derve ve diçû birevin, lê ew pir teng bû û hin gotin dibêjin ku ew girtî bû. Di nav qêrîn û tirsê de, bi dehan kes ketin erdê û di hewldaneke bêhêvî de ji bo zindîmanê di bin lingan de hatin tepisandin. Di nav çend deqeyan de, hol veguherî dojeheke mirovan, jiyana zêdetirî 280 zarokan winda bû û bi dehan zarok jî birîndar bûn. Paşê bajar ket nav xemgîniyeke kûr a ku qet nedîtibû, ji ber ku yek mal jî ji windabûnê xilas nebû. Amûdê bû bajarekî bêdeng, di nav êşa dayikan û hêstirên bavan de. Heta piştî ev qas dem jî, birînên di dilê wan de hîn baş nebûne û ew şeva tarî di bîra giştî ya Kurdan û hemû Sûriyan de hîn jî hatiye kolandin.
Tevî mezinahiya bûyerê, ji bo destnîşankirina kesên berpirsiyar xemsarî û kêmasiyên ku bûne sedema vê karesatê, tu lêpirsînên zelal nehatin destpêkirin. Medyaya fermî ya wê demê tenê bi sînor nûçe belav kir, di demekê de ku welat di serdema aloziya siyasî de bû. Lêbelê, xelkê Amûdê red kir ku ev bûyer ji bîr bibe û ew her sal bi vêxistina mûman û xwendina Fatîhê (beşa destpêkê ya Quranê) ji bo giyanên zarokên ku di destpêka jiyana xwe de mirine, wan bi bîr tînin.

**Agirê laşên zarokan şewitand hîn di bîranînê de nehatiye vemirandin**

Şewata sînemaya Amûdê bûye semboleke kûr a mirovî ku buhayê xemsarî û bêrêziya jiyana bêguneh nîşan dide. Ew her wiha bûye çavkaniya îlhamê ji bo gelek nivîskar û helbestvanên Kurd ku trajediyê di helbest û stranên xwe de nemir kirine, di nav wan de Cegerxwîn, Mihemed Şêxo û yên din. Ew qêrînek li dijî jibîrkirinê ye, peyamek e ku pêwîstiya parastina zaroktiyê û parastina rûmeta mirovan tîne bîra nifşan. Agirê ku laşên zarokan li bajarê Amûdê şewitand hîn di bîranînê de nehatiye vemirandin, berevajî vê ew rêya ber bi hişyarî û mirovahiyê ve ronî dike.

## Xwenasîn



**Germahiya hevgirtinê**

Rohat Bulut

Êdî demsala zivistanê li deriyê me xistiye. Civak jî amadekariyên zivistanê dike. Wekî her deverê civaka kurd jî amadekariyên zivistanê dike. Hewaya cemidî ya zivistanê û bayê sar jiyanê ditevizîn e. Li gund, navçe, tax û bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bayên sar ne tenê hewayê, lê di heman demê de berxwedana bedena mirovan jî diceribînin. Lê dema hevgirtina civakê hebe rewş diguher e. Dema em berê xwe didin rewşên awarte yên sir û seqema zivistanê em dibînin ku li van axan, serma bi agirê hevgirtinê tê germ kirin.
Li vê herêmê, civak ne bi destên dûr ên dewletê, lê bi destên germ ên komunan tê şekilkirin. Li her taxê, li her gundî, mirov dicivin û nîqaş dikin. Jiyan û pêşeroja xwe, dijwariya demsal û rewşên awarte diaxivin. Ji bo zivistana dijwar ji balbatan bigire heta meclis û kumunan nîqaşên çereserî û organîzeya derbaskirina rojên teng tê kirin. Bi parvekirina tiştên bingehîn, bi rêya hevgirtinê çareserî tê pêşxistin. Ji bo germkirinê, nexweşiyan, dan û danûk, qût û zexîre, bi giştî ji bo debarê plansazî tê kirin.
Bi salan e, ev mirov ne tenê bi hewaya dijwar, di heman demê de bi dijwarîya şer, ambargoyê û bêpariyê jî têdikoşin.Belê gelê Rojava dizane: têkoşîna rastîn ne tenê li eniyên şer e, di pêşxistin û parastina sifreyên cîranan, tenduristiya zarokan û stargeha extiyaran de veşarî ye.
Di nava civakên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, hevgirtinek, yekitiye heye. Ev yekitî dihêle ku xwe ji hemû şert û mercên dijwar biparêzin. Lewre peyva "yekîtî" ne tenê dirûşmeyeke xweşik e, di heman demê de formulek ji bo jiyanê ye. Ji ber ku li vir, bêyî yekîtî, piştgirî û hevgirtinê, ne çirayên malan vêdikevin, ne jî kenê zarokan tê bihîstin. Ev hevgirtineke civakî ye. Bi vê yekê hewcedariyên civakî bi cih tînin û ristên xwe yên mirov pêk tînin.
Belê hevgirtina civakî ji bo her şert û mercî ye ku yek ji wan hevgirtinan jî li pêşberî demsalên zivistanê pêş dikeve ye. Mehên zivistanê piwîste civak bi hevgirtineke xurt derbas bike. Peydakirin û bi cih anîna sotemeniyê yek ji pêdiviyên sereke yên mehên zivistanê ye. Ew jî bi hevgirtina civakî, sazî û rêxistinên civakî, rêveberiyên xwecihî pêkan e. Lê di heman demê de pêwîstî bi baweriya hevgirtî û yekitiya civakî heye. Ew baweriya gel jî xurt e. Ji zarokan bigire heta ciwan, jin, zilam, kal û pîran her ferdên civakê bi vê komuna civakî dadikevin. Li aliyê din di heman demê de em berê xwe didinê komîteyên tenduristiyê li gundan digerin, hewl didin ku pêdiviyên tenduristiyê bi cih bînin.
Belê civak di her warî de germahiyek xurt nîşan dide. Di van mehên zivistanê de jî bi pîleyeke bilind dê gerhamhiyeke zêde li Rojava pêş bikeve. Rojava nîşanî cîhanê dide ku azadî ne tenê armanceke siyasî ye, lê şêwazeke jiyanê ye ku her roj ji nû ve tê avakirin. Li van axan, azadî tê wateya parçekirina nanekî ji nîvî ve, daxistina tayê zarokekî û bilindkirina dengê jinekê. Û dibe ku zivistana Rojava vê yekê ji me re tîne bîra xwe: Germahiya rastîn ne ji sobeyê, lê ji germahiya dilê mirovan tê.



# Geşedanên leşkerî û siyasî di Rojhilata Navîn de

**Rojnamevan Kakşar Oremar diyar kir ku li gorî raporek tora Îsraîlî ya bi navê "KAN", Misir, Azerbaycan, Qeter, Urdun û Endonezyayê amadebûna xwe ji bo şandina leşkeran bo Xezayê ragihandine û got, "Tirkiyê jî niyeta xwe ya beşdarbûna di pêvajoya çavdêriya agirbestê li Xezayê de bi şandina leşkerên xwe û piştgirîkirina pêkanîna wê ragihandiye."**

**Viyan Egîd**

Di derbarê geşedanên siyasî û leşkerî yên li Rojhilata Navîn di qewimin, bi taybetî li Filîstin, Îsraîl, Sûdan û hwd, rojnamevan û nivîskar Kakşar Oremar bersiva pirsên Rojnameye me da û hevpeyvîn wiha bû:

**1- Em dibînin ku li Xeza peymanek hat mohrkirin û Tirkiyê û welatên Ereban jî di nava vî peymanê de bûn. Gelo ji nû ve avakirina sînorên Rojhilata Navîn de rola vê peymanê çi ye?**

Berî her gotinekê divê bêjim ku dema behsa ji nûve avakirina sinorên Rojhilata Navîn û pirsgirêkên wê tê kirin du mijarên dîrokî û siyasî dikevin bîra min:
1-Pirsgirêka Kurd
2-Pirsgirêka Filistîniyan
Mijara duyê tim di bala raya giştî de ye lê mijara yekê tevî ku sedan sal beriya ya dine, zêde di bala raya giştî de nemaye.
Ew peyman bi kiryarên li dijhev ku heya niha em dibînin yê nikarîbe xwedî bandoreke berdewam an jî domdirêj be. Tenê di warê vegûherandinan girtiyên zindî û miriyên di destê du aliyan da bandora wê rêkeftinê hebû ku di qada siyaseta navxweyî da Netanyaho zêdetir sûd jê stand. Ji dema ku agirbesta di navbera Hemas û Îsrayîlê de di 10`ê Cotmeha îsal de dest pêkiriye, heya niha gelek şer û bûyerên kujer qewimîne. Li gorî rêveberiya Tenduristiyê a Xezeyê ku di bin kontrola Hemasê de ye, di wan bûyer û êrişan de zêdetirî 90 Filistînî hatine kuştin. Nêzî hefteyek berê, du leşkerên Îsrayîlî jî hatin kuştin. Li rex van rûdanên tije agir û nifir de dîsa jî Trump dibêje agirbesta di navbera du aliyan da yê xwedî wê bandorê nebe ku dîsa şerekî weke yê salên berê di navbera du aliyan da biqewime!. Trump bi îdaya ku "tiştek nikare agirbestê bixe bin metirsiyê" ji hêlekê zaniyariyên îstixbarataî dide artêşa Îsrayîlê û ji hêla din Hemasê tehdîd dike û dibêje: Hemas tenê beşek pir piçûk ji xebatên aştiyê li Rojhilata Navîn pêk tîne û pêwîst e performanseke baş û xûya nîşan bide, ger wiha nebe em ê bi yekcarî wê rêxistina terorîstî ji holê rakin." Herwiha gotin û kiryarên dewleta Amerîka hev nagirin dema ku serokê Amerîkayê geşbîniya xwe li ser berdewamiya agirbesta Xezê a di navbera Îsraîl û Hemasê de nîşan dide û dibêje:"Ti xeterek li ser agirbestê tune ye, lê ger leşkerên wan bêne kuştin, divê Îsraîl bikaribe bersivê bide vê yekê."



Bi vê rewşa ku em dibînin û bersivên dijwarê yên artêşa Îsrayîlê li ser erdê ne mumkine ku ew pirsgirêga dehan salên derbasbûyî bi hemû xweşbaweriyên Trump bêne çareserkirin. Hebûna Tirkiyê û welatên weke Qeterê zêdetir ji ber du sedemên sereke ye: 1. Di warê dubare avadenakirina Xezeyên de sûdekî pir mezin digehe wan. 2. Dixwazin wiha bidin xûyakirin ku nûnerên cîhana îslamî ne û qaşo di xema gelê bira yê Filkistîn û mislman de ne.
Ew durûtiyên Erdogan ji mêj ve ye ku ne di gotin û axaftinên wî yên rojane de belkî di kiryarên wî da hatine selmandin. Li Bakurê Kurdistanê jî behsa biratiya Kurd, Tirk û Ereban dike lê hemû kar û kiryarên wî tenê sûdstandin ji demê û xapandkarî ne û bes.

**2-Herî dawî wezîrên derve yên Tirkiyê, Qetar, Erebistana Suudî, Misir, Îmarat, Urdin, Pakistan û Endonezya ji bo peymana Xeza li hev kombûn, gelo van hêzan rolekî çawa dilêyizin li wir? Bi vî rengî mumkin e pirsgirêkên heyî çareser bikin?**

Carê Hemas li Xezê maye û hêzên din yên alîgirên siyaseta Îsrayîlê jî tenê di gotinê de hebûna xwe eşkere dikin ku bi temamî li dijî desthilata Hemasê ne. Artêşa Îsrayîlê jî hinek xwe ji çeperên berê paşde vekişandiye û bi wan hêzên alîgirên siyaseta dewleta xwe re hevkariyê dikin. Çar komên milîsên Filistînî û dijberên Hemasê li deverên ku ji hêla artêşa Îsraîlê ve têne kontrol kirin û di nav devera ku wekî "Xeta Zer" tê zanîn ku li ser projeyên siyasî û aborî dixebitin. Serokên van koman, di nav de Eşref el-Mansî, Hussam el-Estal û Yaser Ebû Şebab xwe wekî beşek ji projeyek hevbeş ji bo "Xezeyek nû" dane nasandin. Hussam El-Estal dibêje:"Emê di demek nêz de kontrola hemû Xezê û derdora wê bigirin, destê xwe û di bin alayekê de bibin yek." Pêwîst e bê zanîn ku bi rêya deriyê Kerem Şalom û hemahengiya artêşa Îsraîlê hevkariyên madî û locîstîk ji wan komên hevkar bi dewleta Îsrayîlê re têne dayîn. Piştî lihevhatina du aliyan li Xezê dîsa jî Hemasê dest bi reşkujiyên hinek dijberên siyaseta xwe ya wêrankarane. kirin. Îcar êdî bi hebûna hêzên dijberî Hemasê re rêxistinên din yên nû yê li Xezê ava bibin, ji ber ku wê siyaseta Hemasê ji xeynî kuştina dehan hezar kesan û wêrankirina Xezê ti encamek bixwe re neanî. Kombûna wezîrên derve yên welatên navbirî bêencam maye û tenê di ragehandinê de dengekî wan yê bilind û jêstên wan yên rojane diyar bûn, weke di li ser erdê kîjan gûherandin çêkirine? Rewşa jiyana xelkê Xezê çi gûherandin biser de hatiye? Her wiha ez di wê baweriyê de me ku beriya her hêz û dewletekê kilîla çareseriyê di destê wan hêzan de ye ku li herêmê xwedî hêz û îmkanên din yên aborî û siyasî ne. Îran bi rêyên nihînî hê jî hevkariyên madî dide Hemas, Hizbulah û Cihada Îslamî. Yanî destê wan bi yekcarî ji herêmê nehatiye qûtkirin.
Li gorî raporek tora Îsrayîlî a binavê "KAN", Misir, Azerbaycan, Qeter, Urdun û Endonezyayê amadebûna xwe ji bo şandina leşkeran bo Xezê ragihandine. Tirkiyê jî niyeta xwe ya beşdarbûna di pêvajoya çavdêriya agirbestê li Xezayê de bi şandina leşkerên xwe û piştgirîkirina pêkanîna wê ragihandiye.
Lê belê, Îsraîlê bi tundî li dijî hebûna hêzên Tirk di vê mîsyonê de derketiye. Tevî wê yekê ku serokê Amerîkayê Donald Trump berê rola Enqerê û bi taybetî jî serokê wê Receb Tayyip Erdogan, di peymana agirbestê ya di navbera Îsraîl û Hemasê de bi pesndayînê dabû diyarkirin, lê dewleta Îsrayîlê ne li Suriyê û ne jî li Xezê, herêmên din yên stratejî izneke wiha nade dewleta Tirkiyê. Ji ber ku ew dizanin di warê fikrî de Erdogan û rêberên Hemasê di xana Exwan El-Muslimîn de ne. Qet bila ji bîra we neçe ku Erdogan tenê li pey berjewendiyên aborî û mayîna desthilata xwe a tije gendelî ye.



**3-Gelek hêzên navnetewî hin welatan de tevlîhevî, kirîz û qeyran zêde dikin, niha jî li Sudanê şerê hundirîn geş dikin. Gelo polîtîkayên destwerdanê de guhartinek çawa heye?**

Li pey hatina serkar a Donald Trump him ramanên rasîstî li cîhanê zêdetir bûne, him jî pirojeyên ji dagirkerina axa welatên din re zêdetir bûye. Rewşa Rojavayê Kurdistanê û dagirkeriya dewleta Tirkiyê li dijî herêmên di bin desthilata QSD`ê de, şerê Rusya û Ukrayîn, bihêzbûna partiyên netweperest li Ewropa, mijara dijberiya bi penaberan re û hwd… hemû ew fenomenin ku di xana siyaseta dewleta niha ya Amerîka de xwedî cihekî taybetî ne. Ger berxwedana Gerîlayên fedakar nebûya Trump di dewra yeka a serokkomariya xwe de hemû lampên kesk ji Erdogan re pêxistibûn, lê wan di qada siyaset û şer de nehiştin ku hemû herêm bikeve bin desthilata dagirkeriya Tirk de.
Ji sala 2023`an û şûnde şerê navxweyî li welatê Sudan di navbera du aliyên bihêz de rikaberî heye ku ji xeynî, wêranî û tevkuijiyê encameke wê tune. Nakokiyên kûr û tije kîn di navbera Hêzên Çekdar yên Sûdanê (SAF) di bin serokatiya General Ebdel Fetah al-Burhan û milîsên Hêzên Bersiva Bilez (RSF) yên bi serokatiya Mihemed Hamdan Degalo de ye. Dema em behsa şerên di navbera du aliyan de dikin tevkujiya Darfûr û awarebûna zêdetirî sê milyon hevwelatiyên tê ber çavên me. Rêxistinên mafên mirovan û ajansên ragehandinê rastiyên tije tehlîl eşkere dikin ku gelek sivîlên li Darfûrê di çarçoveya komkujiya Massalit de hatine kuştin ku wekî paqijkirina etnîkî an jî jenosîd hatiye binavkirin. Dîmenên herî tirajîk û xemnak kuştina zarokên bêsûçe. Mudaxele an jî desttêwerdanên biyanî di şerê Sûdanê de şandina çekan ji hêla welatên weke Çîn, Rûsya û Tirkiyê jî bûye sedem ku hê jî şer berdewam be. Piştgiriya herêmî ji bo hêzên bersiva bilez ji Îmaratê û welatê Çadê hatine. Di heman demê de welatê Misrê jî piştgirî daye artêşê. Şerekî wiha domdirêj û dûr ji hemû prensîpên insanî kirîzeke mirovî û mezin afirandiye. Kêmasiyên giran yên xwarin, av, derman û alîkariyê, girtina nexweşxaneyan berbelav, belavbûna nexweşiyên vegir, koçberiya berbelav, talankirina alîkariyên mirovî û hilweşîna hema bêje tevahî ya sîstema perwerde li hemû Sûdanê û binesaziyê ew encamên diyaryên wî şerê navxweyî ne. Di bersiva dijberiya bi şer re gelek welatên weke Kanada, Yekîtiya Ewropî ji ber binpêkirinên agirbest, mafên mirovan û kiryarên bêîstîqrarkirinê, li ser hinek kes û aliyên şerker û berpirsên artêşê hinek ceza ferz kirine, lê ew jî heya niha bêencam mane.

# ‘Tirkiyê bi hincetan, biryara 3 salan a mayîna artêşê derxist’

Lêkolînerê di Navenda Lêkolînan a Firatê de Lezgîn Ibrahîm da zanîn ku Tirkiyê bi hincetan hebûna xwe di Sûrî û Îraqê de rewa dike, ji ber wê biryarên mayîndekirina artêşa xwe di Sûriyê, Îraq û Lubnanê de ya sê salan derxist.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Di van demên dawiyê de biryara dirêjkirina mayîndebûna artêşa Tirkiyê li Sûriyê û Îraqê ji aliyê Perlamana Tirkiyê ve hat dayîn. Têkildarî naveroka vê mijarê û bi taybet di Sûriyê de, lêkolînerê di Navenda Lêkolînan a Firatê Lezgîn Ibrahîm bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Piştî hilweşîna Rêjîma Baas û hatina hikumeta veguhêz, destwerdana Tirkiyê li siyaset û xaka Sûriyê nehat bidwîkirin. Gelo armanc û niyeta Tirkiyê li ser Sûriyê û mayîndekirina artêşa Tirkiyê hûn çawa dinirxînin?**

Biryara ku ji aliyê Perlamana Tirkiyê ve hatiye dayîn a ku mayîna artêşa Tirkiyê li Sûriyê û Îraqê 3 sal din dirêj bike û 2 salan jî li Lubnanê bimîne. Mirov dikare vê biryarê ji gelek aliyan ve bixwîne, him di aliyê piştî şerê Xezayê rewşa ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibe û hilweşîna Rêjîma Esed û a din jî girêdayî hundirê Tirkiyê. Mirov dikare yek û yek bigre dest; Perlamana Tirkiyê ev cara yekê ye ku li ser esasê sê salan li vê biryarê erê dike. Ji ber dema bûrî her sal ev biryar li ser esasê salekê dihat nû kirin, lê belê vê carê kirin sê sal. Hebûna Tirkiyê di mayîndekirina xwe di Sûriyê û Îraqê de bi hinceta ku “Em şerê terorê dikin” e. Lê tevî ku pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” dest pê kiriye, rêjîma Baas hilweşiya, herwiha danûstandin di navbera QSD’ê û hikumeta veguhêz de tên çêkirin ku êdî Amerîkî û Koalisyona Navnetewî jî di mijarê de ne ku ev hemû dihêlin rewş ber bi hewildanên aramî û çareserkirina siyasî ve biherike. Lê tevî van hemûyan jî dewleta Tirkiyê biryara xwe 3 slan dirêj kiriye. Ev tê wateyê ku idiayên Tirkiyê yên hebûna xwe di Sûriyê de ji bo tenê şerê gelê Kurd û şerê terorê bike; ne rast in û hemû hincet in ku tenê dixwaze xwe di van dewletan de mayînde bike bi taybet Sûriyê û Îraqê. Niha Tirkiyê piştî hilweşîna rêjîma Baas êdî dibîne ku rewş jê re guncav e û qada Sûriyê jê re vekiriye ku bikaribe dagirkeriya xwe di Sûriyê de mayînde bike. Bi taybet ji ber rewşa hikumeta veguhêz a ku tê re derbas dibe bêtecrûbe û lawaziyên ku jiyan dike ye, herwiha nebûna cesaretê ku li hember Tirkiyê biryarekî bigre. Ango heya niha hikumeteke ku bikaribe ji bo berjewendiyên gelê xwe bifikre nehatiye avakirin, ji wê zêdetir hikumeteke li gorî zihniyeta Islamî, li gor Tirkiyê û dewletên xwedî biryar, hatiye avakirin. Ji ber wê jî Tirkiyê ji vê yekê hêz digre û dibîne hewce nake ji bo salekê biryarekî wiha bigre, xiste 3 sal. Tirkiyê baş dizane ku hikumeta heyî di pêvajoya veguheztinê de ye û demkî ye, ev yek jî wê 5 salan berdewam bike. Ji ber wê Trikiyê wê di nav van 3 salan de hîn bêhtir hêzên xwe di Sûriyê de berfireh bike, dagirkeriya xwe zêde bike, destwerdanê li biryarên Şamê bike û li di aliyê aborî, siyasî, istixbaratî, leşkerî û civakî de bandor bike û hebûna xwe misoger bike. Tu niyeteke Tirkiyê ku hikumeteke Sûriyê ava bibe, lihevkirinek di navbera QSD’ê û Şamê de çêbibe herwiha xwe vekişîne ji xaka Sûriyê, nîne. Berûvajî wê dixwaze dagirkeriya xwe zêde bike, hem jî projeyên xwe yên weke Lîwa Iskenderon hene ku dixwaze careke din pêk bîne. Çawa ku di wê demê de vekşandina Birêtaniya ji herêmê çêbû û hwd… niha ev pêvajo weke wê pêvajoyê dihesibîne; Îran ji herêmê derket, Rûsya lawaz bû, hebûna Amerîka ji xwe re bi kar bîne û Israîl ji xwe re xeter dibîne. Ji ber wê dixwaze xwe demeke dijrêj di Sûriyê de bi cih bike heyanî ku ev rewş û qeyranên di Rojhilata Navîn de tên jiyankirin, derbas bibin, bi taybet şerê di navbera Îsrayîl û Îranê de ka wê bighîne çi astê û piştî demeke dirêj cihê xwe di nava Sûriyê de bigre. Wê rasterast van herêmên ku dagirkirine weke Lîwa Iskenderon, Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî, Cerablos, Ezaz, Bab û hwd… girêdayî dewleta Tirkiyê bike ku heya niha tu biryarên hikumeta Sûriyê li ser nînin.

**Di 22’ê heyvê de biryara dirêjkirina mayîndebûna artêşa Tirkiyê li Sûriyê û Îraqê ya sê salên pêş hat derketin, gelo vê yekê ji bo Îraqê taybet hûn çawa dixwînin?**

Ya din ji bo Îraqê jî; Tevî ku artêşa Tirkiyê li Îraq û herêma Kurdistanê ji çend salan ve bi hinceta şerê PKK’ê dike li wir e û dagir kiriye ku her sal perlamana Tirkiyê biryara mayîna artêşa xwe li wir nû dikir. Lê niha rûxmî ku pêvajoya aştiyê hatiye destpêkirin û pêvajo ber bi aştiyê ve diherike, lê careke din biryara mayîna 3 salan da. Bi vê yekê re xuya dibe ku Tirkiyê êdî bi stratejiyeke nû û demdirêj difikire ku xwe li herêma Kurdistanê jî mayînde bike. Bi vê re ger pêvajoya aştiyê bi ser bikeve jî, tu niyeta wê ya ku ji herêma Kurdistanê vekşe nîne. Her tim dixwaze destwerdana xwe di herêmên Kuristanê û Îraqê de hebe, bi taybet ew niha hesab dike ku muhtemele di navbera Îran û Israîlê de şerekî nû biqewime ku helbet wê bandora xwe li ser Îraqê jî bike û pêşbîniy rûdana şerekî di navbera Îraq û Îranê



de jî pêk were. Ji ber wê dibîne salek têrê nake ku di guhartinên nû de rolekê bilîze. Ji ber Tirkiyê difikre ger şerek derkeve û bandora xwe li Îraqê bike wê careke din dagirkeriya xwe berfireh bike û ber bi Mûsil, Bexdad û heyanî Şengalê bibe. Em dixwazin bêjin ku Tirkiyê nema hebûna leşkerên xwe di Sûriyê û Îraqê de tenê ji bo şerên Kurdan bike, hiştiye. Stratejî û projeya berê ya Osmaniyan di serê wê de heye ku hemû herêmê bixe bin dagirekriya xwe, ji ber nepêkanîna vê xeyalê, niha hewil dide ku ji van guhartinên di Rojhilata Navîn de diqewimin sûdê werbigre. Çawa ku li Sûriyê ji destpêka aloziya ku derketî de cihê xwe tê de girtin û ev bû 13 sal in xwe mayînde kiriye, dixwaze li Îraqî jî vê yekê bike. Yanî Tirkiyê bi hincetan dixwaze xwe li van welatan mayînde bike.

**Li ser Lubnanê jî dewleta Tirkiyê biryareke wiha girtiye, Gelo nirxandinên we di vê derbarê de çi ne?**

Rewşa Lubnanê ji Sûriyê û Îraqê hinek cudatir e. Tirkiyê ji ber hêzên Tirkiyê yên heyî girûpek in di nava Şandeya Unîfil a wir de ye, (Rêxistina Parastina Aştiyê) di bin navê Hêzên Navneteweyî de li ser sînorên Israîl, Lubnan û derdora wê ku ji bo şerek rûnede, bi cih dibin. Yanî ew hêz ne ji bo şerkirinê li wan deran dimîne. Lê ya balkêş ku perlamana Tirkiyê biryara mayîna 2 salan di hundir Lubnanê de daye. Tevî ku biryara Navneteweyî derket ku ji vir heyanî sal û nîvekê divê hemû hêzên Unîfil ji wê derê derkevin û artêşa Lubnanî a nû li ser sînor cihê xwe bigrin. Xuyaye ku Tirkiyê bi fikirandina ku ew hêz ji wir vekişe, divê altrnatîfa mayîndebûna xwe di Lubnanê de bibîne, ev yek jî bi vê biryarê misoger kir. Bi taybet hîn rewşa Lubnanê zelal nebûye, ne diyar e ku dibe demên pêş de weke Îraqê şer di navbera Hizbullah û Israîlê de derkeve, ji ber hîn Hizbullah çekên xwe dananîne û hîn gevên Israîlê û Amerîkî hene. Tirkiyê ji rewş û tevlîheviya ku di Lubnanê de tê jiyankirin, dixwaze ji berjewendiyên xwe re bikar bîne.






## Nirxandinek di hevdîtina Tramp û El Şeri de!

**Dilyar Cizîrî**

Ev demeke hikumeta veguhêz a Sûriyê propogandaya serdana serokê xwe Ehmed El Şeri ji Amerîka re dikir. Balkêş bû Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyê Hakan Fîdan di dema civînê de xwe gihand Amerîka û piştî civîna Tramp û El Şeri, li gel şandeya Sûriyê û wezîrê derve yê Amerîka re civîn lidar xist. Serdana Hakan Fîdan asta zêde ya destwerdana wan di dosyaya Sûriyê de nîşan dide. Di heman demê de ne baweriya wan bi desthilata Ehmed El Şeri raber dike. Wiha diyar dibe, desthilata Tirkiyê bi tirse El Şeri bêyî wan itîfaqan imze bike.
Li aliyê din balkêş bû Rêveberiya Tramp bi sivikayî nêzî vê serdanê bû. El Şeri di deriyê paş re derbasî Koşka Spî kirin. Rê ne dan rojnamevan civînê bişopînin. Di dawiya civînê de tu daxuyaniyên hevbeş ne hate dayîn. Fotoyên hatin weşandin, di runiştina Turamp û tîma El Şeri de ji bilî piçûkxistinê peyama “tu hatiye perspektîfên xwe bigre” Bi vê serdanê wiha fam neke me te fermî nas kiriye. Xaleke din a herî girîng mijara “cezayên Qeysere” di vir de jî hikûmeta veguhêz a Sûriyê wiha fam kiribûn dê Qeyser bi temamî ji ser wan rake. Lê ceza tenê hatiye cemidandin. Ev tê wateya “Em ê te bişopînin, ka dê komkujî dûbare bibin an na?” Ev xalên giring ên dema hevdîtinê ne.
Lê piştê yek ser Wezareta Karê Derve ya Sûriyê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de hate gotin pêkanîna Peymana 10’ê Adarê û entgresyona QSD’ê di Arêtşa Sûriyê de hate nîqaşkirin. Di vê daxuyaniya hikûmeta veguhêz de mirov rehet dikare bêje mijara QSD’ê û hebûna wê di Artêşeke niştimanî ya Sûriyê de xala sereke ya li ser maseya nîqaşên wan bû.
Tramp jî piştî hevdîtinê ji ragihandinê re got Têkiliya El Şeri bi Serokomarê Tirkiyê Erdogan re xurte. Di nerîna min de ev jî peyameke Amerîka ji hikûmeta veguhêz a Sûriyê û hikûmeta Tirkiyê re ye. Bi vê yekê Tramp ji El Şeri re dibêje divê tu henekî xwe ji bin bandora dewleta Tirk derbixe, da tu karibe biryaran pêk bîne. Her wiha got di demeke nêzîk de dê hin tişt derbarê Sûriyê de werin ragihandin. Ev jî nîşaneya wê ye tişta ji El Şeri xwestine bi dest xistine. Bi taybet di mijara têkiliya Îsraîl û Sûriyê de, dê gavên mezin werin avêtin. Ev jî di rojên pêş de wê di pêkanîna xalên lihevkirinê de diyar bibe. Di mijara pêkanîna pêkanîna peymana 10’ê Adarê de jî wê êdî rê li ber gavavêtinê vebe. Îcar heger El Şeri karibe xwe hinekî ji bin baskê dewleta Tirk derbixe. Heger nikaribe dibe peyman têk biçe.
Lê niha ya girîng em behsê bikin, hikûmeta veguhêz a qaşo dê bikin beşek ji Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ’ê dê çawa karibe li dijî DAIŞ’ê şer bike. Ev ne pêkane û ne mimkine bibe. Lê bi vê Amerîka û Koalîsyona Navdewletî yên dizanin ewê nikaribin şerê DAIŞ’ê bikin, dixwazin barê wan pê giran bikin. Nerîna min ji ber vê xalê dê di rojên pêş de tundiya heyî ya Sûriyê hîn girantir bibe.



# ‘Azadkirina girtiyên siyasî, wê li Tirkiyê roleke demokratîk bilîze’

Parlementerê Partiya DEM’ê yê Amedê Serhed Eren da zanîn ku azadkirina girtiyên siyasî wê ji bo tevahiya Tirkiyê di mijarên qanûnî, aştî û çareseriya demokratîk de roleke girîng bilîze û got, “Divê dewleta Tirk demildest girtiyan berde.”

**Hemza Sêvo**

Ji destpêka avakirina komara Tirkiyê ve siyastetmedarên Kurd rastî desteserkirin û girtinê tên. Bi sedan siyasetmedsar ji ber doza gelê Kurd a rewa ji hêla dewleta Tirk ve hatine desteserkirin û bi bêedaletî ketine zindanan.
Di pêşveçûna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de diviyabû xala girtiyên siyasî yên Kurd were li ser maseya komisyonê û dewleta Tirk vê mijarê çareser kiriba. Lê heta roja îro dewleta Tirk gav ji bo çareseriyeke hiqûqî û dadweriyê neavêtiye. Derbarê heman mijarê Parlementerê Partiya DEM’ê yê Amedê Serhed Eren ji rojnameya me re axivî.

**‘Tekane rê; avêtina gavên hiqûqî û siyasî ne’**

Serhet Eren destnîşan kir ku rêya çareseriyê ew e ku dewleta Tirk gavên zagonî û siyasî bavêje û wiha got: “Pêkanînên kêfî yên ku li girtîgehan dewam dikin, bi taybet jî dirêjkirina infaza girtiyan ne tenê pirsgirêka girtiyan e. Ev mijar rasterast bandor li pêşeroja civakê jî dike. Di rewşeke hêviyên aştiyê pêşketî de, bêhiqûqî dirêjkirina cezayên înfazê, hêviyên aştiyê dişkîne û baweriya civakî qelz dike. Pêvajoya aştiyê bi gavên dualî, bi sazkirina bawerî û meşrûîyeta civakî dimeşe. Eger aliyek çekan dayne, li hember vê gavê aliyê din maf û daxwazên siyasî yên aliyên din înkar bike ev yek wê rê li ber pirsgirêkan veke. Ji ber vê helwestê wê pêvajo bi yekalî bimeşe û ev jî rê li ber têkçûyîna çareseriyê vedike. Azadiya girtiyan, bidawîkirina biryarên înfazê yên dijhiqûqî, bicihanîna mekanîzmayên edaletê yek ji şertên pêşîn e ku pêvajo li ser bingeha civakî bê pêşawazîkirin. Eger armanca dewletê civakbûyîna aştiyê be, divê polîtîkayên ku civakê ceza dike esas negre, divê helwesteke ku pêşeroja demokratîk esas digre, bimeşîne. Rewşa ku îro li girtîgehan derketiye holê, hem di gelê Kurd de û hem jî di raya giştî de pirsa ‘’gelo bir rastî jî çareseriyeke adil tê xwestin?’’ derdixe pêş. Ji bo ev pirs di rojevê de derkebikeve, tekane rê; avêtina gavên hiqûqî û siyasî ne.”

**‘Berdana girtiyên siyasî, wê li Tirkiyê roleke demokratîk bilîze’**

Eren da zanîn ku berdana girtiyên siyasî wê ji bo tevahiya Tirkiyê di mijarên qanûnî, aştî û çareseriya demokratîk de roleke girîng bilîze û wiha domand: “Bawerî ne mijareke yek alî ye. Bawerî bi gavên şênber ên civakî derdikeve pêş. Îro daxwaza gelê Kurd û civaka Tirkiyê zelal e. Wek hemwelatiyê wekhev daxwaza li ser esasên ristên hiqûqa gerdûnî, siyaseteke demokratîk, welat û jiyaneke wekhev, dikin. Gavên wekî azadiya girtiyan, di warê darazê de li ser esasên hiqûqa gerdûnî veguhestin û rakirina astengiyên beşdarbûna siyaseta wê ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo demokratîkbûyîna tevahiya Tirkiyê wê roleke mezin bilîze. Mînakên wekî Başûrê Afrîkayê, Kolombîya û Bakurê Îrlandayê vê rastiyê ji me re vedibêjin. Li Tirkiyê jî em hatine berbanga heman rewşê. Îro gelê Kurd tenê daxwaza mafekî nake, ji bo civakbûyîna aştiyê peyameneke civakî pêşniyar dike. Heke dewlet deng bide vê daxwazê û baweriya zagonî û hiqûqî saz bike, wê di navbera gelan de îradeya jiyana azad û wekhev pêş bikeve.”

**‘Divê demildest dewleta Tirk girtiyên siyasî berde’**

Parlementerê Partiya DEM’ê yê Amedê Serhed Eren tekez kir ku divê bi awayekî bi lez girtiyên siyasî werin berdan û wiha bi dawî kir: “Mixabin kengî li Tirkiyê pêvajoyeke çareseriyê pêş bikeve, mekanîzmayên dewletê li aliyekê hêvî didin, lê aliyekî wê yê din dikeve nav hewldanên zext û pêkutiyan. Eger îro li dijî sedan



girtiyên siyasî tecrîd hebe, sedema vê tenê rewşa dijî zagonî nîne, ev yek di heman demê de nîşan dide ku feraseta dewletê ya ku înkar û ewlehiyê esas digre, di meriyetê de ye. Em baş dizanin ku aştî tenê bêdengkirina çekan nîne. Aştî bi parastina rûmeta mirovahî û esasgirtina ristên hiqûqa gerdûnî ye. Zextên wekî tedawînekirina girtiyên nexweş, astengkirina mafên têkiliyê, astengkirina tahliyeyên bi şert û gelek mînakên din ên ku li dijî girtiya dimeşe, her çend di zimanê fermî de wek ‘’ewlehiya navxweyî’’ bê pênasekirin jî, di bingeha xwe de yek ji wan qadan e ku aştiya civakî hedef digre û sabote dike. Ji ber vê yekê, sedema bingehîn a vê rewşê, siyaseta ewlehkar, pêkanînên darazê û feraseta cezakirna nasnameya siyasî ye. Ji bo ev pêvajo bi gavên demokratîk bimeşe, divê dewlet demildest dev ji bêhiqûqiyên li girtîgehan berde. Divê neyê jibîrkirin ku aştî, di destpêkê de bi sazkirina hiqûqî û rêzgirina mafên mirovan dest pê dike.”

## HTŞ’ê di enîyên Rojava û DYA’ de ye!!!



**Zekî Bedran**

Ehmed Şera birin DYA. Niha li wir hevdîtinan dike. Şera yekem desthilatê Sûriyê ye ku serdana DYA dike. Serokên berê ji ber nakokîyên bi Îsraîlê re ji DYA re dûr ketin. Di salên dirêj ên ku Hafiz û Beşar Esed li ser desthilatdariyê bûn de, wan ji danûstandinên xwe li DYA nedikir in. Wan peywendiyên xwe bi giranî bi Sovyetan re, û paşê jî bi Rûsya re pêş xistin. Di cîhanek dualî de, vebijêrka Sûriyê Sovyet bû. Şera, wekî ku tê zanîn, çekdarê El Qaîde û DAIŞê bû. Ev hişmendiya wî bi gelemperî li ser bingeha dijî-Îsraîlê ye. Ji ber ku DYA piştgiriyê dide Îsraîlê, nêzîkbûnên dijî-Amerîkî jî di polîtîkayên wan de roleke girîng dilîze. Binesaziyan hişmendîya wan, ku li ser bingeha şîrovekirineke hişk a olî ye, bi dijî semîtîzmê ve girêdayî ye. Ev birdozîyên li ser bingeha olî bi gelemperî ne li dijî kapîtalîzm û hişmendîyên dewletparêz in. Ew di derbarê dewletê de pir hişktir û desthilatdartir in. Hevpariya herî berbiçav di navbera hêzên li ser bingeha ola Îslamê, nakok û dijber de dewletparêziya wan û lêgerîna wan a desthilatdariyê ye. Ji Îranê bigire heya Erebistana Siûdî, ji Afganistanê bigire heya El Qaîde û DAIŞ’ê, hemî armanc dikin ku bibin desthiladar û civakê bi rêya rêbazên dewletê bi rêve bibin.
Dijberiya wan a li hember Îsraîl û DYA, ne ji birêgezî an jî nerînên wan yên dijkapîtalîzmê tên. Ji bilî Îranê hemû hêzan helwesta xwe ya li hember DYA û Îsraîlê bi awayekî nerm kirine an jî bi wan re hevkariyê dikin. Îran her wiha hewl dide ku bi DYA û cîhana Rojava re li hev bike. Piştî şerê 12 rojan ku bi Îsraîlê re pevçûn, Îran êdî ne ewqas hêzdar e weke ber ê. Piştî qelskirina Hizbullahê, bêçalakkirina Hamasê û têkçûyina rejîma Baasê li Sûriyê, Îran jî li lihevkirinê re, neçar ma. Tevî vê yekê, ew hîn jî armanca Îsraîl û DYA ye. Ehmed Şera serçeteyê El Qaîde û herî dawî jî, serkeşe rêxistina bi navê HTŞ’ê, li DYA çi dikin? Berovajî vê, çima DYA Şera tîne Qesra Spî? Ev mijar dê bi awayekî zelal werin nîqaşkirin. Lêkolîn û lêpirsîna wan mijaran pêwîst û girîng e. Kesên ku li desthilatdariyê digerin, bêyî ku ol an fikirandinên wan çi be, dê her tiştî bikin da ku dewleta ku armanca wan bigirin û serwer bibin. Girîng e ku ev ji aliyê helwesta felsefî û birdozî ve neyê paşguh kirin.
Li pişta Şeraa li Sûriyê piştgiriyeke xurt a gel nîn e. Baas desthilatdariya xwe winda kir. HTŞ çû Şamê û desthilatdarî girt destê xwe. Ev bi cureyekî darbeyê qewimî û valatiyê sûd wergirt. Gel ji rejîma Baasê bêzar bû. Wan di şerê navxweyî de bedelên giran dabûn. Ew bêrêxistin bûn. Û berovajî şoreşan, girseyan bi coş pêşwazî li HTŞ’ê nekirin. Bi mîlyonan kes li kêleka wê kom nebûn. Ew ji hilweşîna rejîma Baas’ê kêfxweş bûn û di rewşekê de man ku pêşketinan temaşe bikin. Berî ku gel bêhna xwe bide, HTŞ’ê li dijî Elewî û Durzîyan komkujî destpê kir. Van bûyeran bû sedema zêdebûna gumanên li dijî HTŞ’ê hem li hundir û hem jî li derveyî welêt. Kêfxweşiya wan ji hilweşîna rejîma Baas cihê xwe da temaşewan û bendewariyekê xemgînî. Îsraîlê pêşveçûna rêxistineke olî ya tundrew li ser sînorên xwe wekî gefek li ser ewlehiya xwe dît û dest bi hilweşandina hemû binesaziyên xwe ya leşkerî yên berê kir. Hikûmeta demkî ya vegûhêz nekarî tiştekî bike. Her çend xuya bû ku DYA bi tevahî van êrîşên Îsraîlê erê nekir jî, helwestekî neyinî jî nîşan neda. Hikûmeta Tirkiyê, ku alîgir û piştewanê sereke yê HTŞ’ê ye, tenê temaşevan ma. HTŞ’ê ev yek dît û fêm kir ku tevî hewldanên DYA û Îsraîlê jî nikare desthilatdariya xwe biparêze. Ji bo ku di desthilatdariyê de bimîne, piştgiriya DYA û cîhana Rojava hewce dikir. Sûriye di bin ambargoyeke giran de ye. Rêyeke wê ya başbûna aborî û vegerandina ser piyan tine ye. Rakirina ambargoyê erêkirina DYA’yê hewce dike. Wekî din, peymanek bi Îsraîlê re êdî ne hilbijartinek e, lê niha êdî weke pêwîstiyek tê dîtin.
Di mijara Filistînê de hêza herî bêdeng HTŞ’ê bû. Ew nekariya piştgiriya xwe ji bo Hemasê bîne li ser ziman. Filistîn, ku ew pir caran qala wê dikin, ji bo ku di desthilatdariyê de bimînin, mijara wê paşguh kir in. Dema ku Filistînî rastî komkujiyan tên, wan bi rastiyê de çavên xwe girtine. Dema ku ev kiryaran bi hev re têne berhev kirin, ne hewceyî gelek agahdariyê ye ku mirov pêşbînî bike ku Şera dê şertên DYA bi pejirîn e. Şara dê tevlî hevpeymaniya bi pêşengiya DYA ya li dijî DAIŞ’ê bibe. Ew ê xwe bi pêşengiya ku ji hêla DYA ve hate sazûmankirin re bike yek ku bi şêwaza ewlehiyê ya Îsraîlê re li hev dikin. Mirov dikare bi pêşbînî bike ku di demek dirêj de, ew ê neçar bimîne ku tevlî Peymanên Îbrahîmî bibe. Bi kurtasî, Şera dê Sûriyê di nav eniya Rojava de bi cih bike! Ji ber ku DYA û Ewropî li Sûriyê çareseriyêkê din nedîtin, ew li hev kirin ku bi Şera re rê bikevin. Wan li ser HTŞ’ê li hev kir. Brîtanî pêşengiya vê hewildanê dikin. DYA niha hêza biryardar e. Bi qasî ku ew dikarin Şeraa bikin alîgirê xwe, ew ê ambargoyê rakin û Sûriyê bixin di bin serweriya xwe. Têbînîyekê balkêş ew bû ku dema Şeraa çû DYA, Wezîrê Karûbarên Derve yê Tirkiyê jî bilêta xwe ya çûyina DYA girt. Tirkiyê destwerdanên lobiyê yên Şeraa girt li ser milên xwe. Bi taybetî wan dixwest ku HTŞ’ê tevlî hevpeymana li dijî DAIŞ’ê bibe. Armanca wan ew bû ku QSD ji nav hevpeymaniyê derxînin û rê li ber Kurdan bigirin ku li Sûriyê statuyekê bi dest nexin. Nêzîkatiyên dijî Kurd mijarek stratejik û berfireh e. Ew naxwazin ku li ser vê mijarê de derdorên aligirê Kurdan zede bibin. Ji ber wê sedemê wekî dewletek, hewldanên wan li Rojhilata Navîn û li seranserê cîhanê jî bênavber berdewam dikin!



## FARC Û PKK’ê

**Farûk Sakik**

“Ev aştiya ku bi salane, di bedela wî de me şer kir, aştiyek ku wê bêedaletiya li ser vê axê bi dawî bike.”
Lîder û pêşengê rêxistina FARC, Manuel Marulanda bi van gotinê xwe bi dewleta Kolombiya re dest bi muzekereyan dike.
Di sala 1964an de FARC (Fuerzas Armadas Revolucionarias de Colombia) li dijî newekhevî û edaletsiziya li Kolombiya, wek tevgerek gerilla hat damezrandin.
Di sala 2012’an de pêvajoya muzekereyan ji Kuba destpêkir û piştî demek li Kolombiya dewamkir. Bingeha dînamikan muzekereyan di 4 merheleyan de derbas di bûn:
-Reforma axê û pêşxistina gundan
-Çekdanîn û entegrasyon
-Beşdariya siyasî û mafên demokratîk
-Mafên qurbaniyan û tezmînat
Têkoşîna FARC dişibe têkoşîna PKK’ê. Ev çar merheleyên li Kolombiya dişibe muzekeriyên PKK’ê. Dive heta sedemên destpêkirina şer ji holê ranevin, bêdengbûna çekan ji aştiyêre nabin bersiv. Li Kolombiya edaletsizî û newekhevî hebû. Ji bo vî mafî şer kiribûn û di merheleya muzekereyan de ev di rêza yekem de bû. Dema ku ev yek hat çareserkirin FACK di sala 2016’an de derbasî qonaxa çekdanînê bû.
Pêvajoya muzekereyan dibin çavderiya Netewên Yekbûyî de derbasdibû.
Çekdarên FARC’ê di bernameyên entegrasyona jiyana sivîl de cih girtin.
Ji şervanên bere re, piştgiriya perwerdehî, kar û alikariya psîko-sosyal hat dayin.
Kurdan jî li dijî red, înkar û asimlasyonê şer kiribûn. muzekereyan destpêkir Rêber Apo got, me van tiştan da seknandin. Ji bo mafê-kolektif û nasnameya Kurdan me şer da seknandin, êdî dema avakirina civakek demokratik e.
Kurd ji merheleya çekdanînê derbasî merheleya entegrasiyonê bûne. Îro pêvajo, derbasî qonaxa ku Kurdên heta îro şer kirine, wê çawa werin tevlî siyaseta demokratik bibin. Bi siyaseta demokratik wê civakek demokratik çawa avabikin, ev tên nîqaşkirin.
Ji bo di pêvajoya muzekereyên Kurdan de, aliye sêyem tuneye ku çavderî bike.
Ji ber vê yekê dewleta Tirkiyê astengiyan derdixe. Gavên bi fedekariyek mezin ji aliye Rêber Apo ve tên avêtin bê bersiv dimînin.
Mînakek FARC ya di şibê PKK’ê, di qada legalde avakirina partiyek siyasî bû. Li Kolombiya piştî çekberdanê di sala 2017’an de partiyek bi navê ‘Colombia Humana’ (Kolombiya Mirovî) hat avakirin.
Rêber Apo jî bale dikişine ser partiya DEM. Dîsa dibêje ku ev partî were xûrt kirin û di nav vê partiye de siyaseta demokratik were meşandin.
Pêvajoya aştiyê ne tenê ji gavên teknîkî û siyasî pêktên. Pratîkên sazûmanî yên wekî naskirina mafên qurbaniyan, avakirina bîrdariyan û perwerdehiya aştiyê, merheleya herî girînge.
Dema muzekereyên li Kolombiyayê ev yek pêkhatin û roleke girîng di avakirina aştiya civakî de girt.
Bi heman awayî, li Tirkiyeyê jî divê dermankirina bîranînan û naskirina mafên qurbaniyan beşek girîng a pêvajoyê be. Dive ku dewlet ji bo “Roboskî” hin tiştan bike. Nabe ku em vê komkujiyê li pey xwe, di nav rûpelên dîrokê de bihêlin û derbasî civakek demokratik bibin.
Lê li bendê nesekinin ku dewlet van gavan bavêje. Me bere bi çekan, bi şer dixwest ku dewlet hin gavan bavêje. Îroj ji bo civakek demokratik dive siyaset were meşandin. Ji bo ku ev jî pêkwere dive paradigmaya Rêber Apo baş were fahm kirin û îdrak kirin.
Rêber Apo bi manifestoya xwe ya di hejmara yekem ya serxwebûn de, partî avakir û şer da destpêkirin. Îrojî dixwaze, bi ‘manifestoya civaka demokratik’ ev merheleya piştî partî û şer, bide destpê kirin. Dive manifestoya wî demildest were çapkirin û belav kirin. Civak li benda vê manîfestoyê ye.